GIRINGIYA AFRETÊ LI NIK ZELAMÎ

Cîhan Koremarkî

Her li destpêka hebûna jiyanê jin û mêr yan nêrûmê pêdiviya hebûn û berdewamiya jiyanê bûne û jêk cûda nebûne. Cûdabûna her du regezan yanî bi domahîhatina jiyanê û nemana herdu regeza, ji ber hindê ku her du regez pêdiviyên hebûnê û tewawker yên hevdune û giringiya ciya ji ya dîtir giring ji nîne di zêdetir nîne. Tinê di dabeşkirina erk û karan de ji ber hokar û fakterên fîzyolojî û pêkhatên leş cûdahî hebûne û kartêkirina xwe kiriye li ser desthelat û pêçêbûna layekê li ser layekê dîtir. Lêbûrîna wextê ku jin dayîk bo ya li dest bo desthelat ji ber wan hokara û mijûlbûna dayîkê bine xweşî û zarokbûnê ve desthelat bo zelamî vegeriya ku dinya pitir bizavê bikin bo peydakirina kerestê xarinê. Lê li gel pêşveçûna mirovî ji layê hoşî û jîrî, aborî û civakî ve êrî bangewaz bo wek heqiyê di hindik welatiyên pêşkeftî afret şiyan cihê xwe yê sirûştî bigereneve û wek hevbin li gel zelamî.

Li civkê me de hêşta sîstemê baviksalarî yan zalbûna regezê nêr li ser yê mê ya diyar e. Lê ew jî hêdî hêdî ber bi wekheviyê diçe. Çinku êdî xelkê me jî yê hest bi cihê giring, civakî tûxmê mê û dike û ya dihête rakêşan bo meydana karî û berhemhênana weku Afret jî dibe xwedan biryar û desthelatdar û xwe li rêza zelamî bibîne. Raste jî kulturê me yê civakî gelek cara we dike ku afret bi xwe jî bibe rêgir beramber zelamî bo bi destveanîna mafên xwe yên sirûştî lê li gel bûrîna wextî hişyarî û rewşenbîriya wî zêdebe rêja daxwezkerên mafên wan ya pitir kê dihê. Lê her di wî demî de rêja zelamîniyê daxwezkerên mafên Afretê ya diyar û pêşçav û kartêkere. Afret, giringiyeka mezin heye di jiyana zelamî de. Çinku zelam ji afretê çê bûye. Bi cotbûna zelamî li gel afretê jiyan berdewamiyê diditê lewma demê zelam bi jîrane hizir û bîrên xwe di afretê de dike û rolê wî dibîne dê

zêdetir bihayê wê zane, çinku sererayî wî rolê pîroz yê afret dibîne bo berdewamiya jiyanê. Her afrete jêderê xweşiyê bo zelamî nemaze eger seredereyeka baş di gel de bihête kirin, belku afret piştevan û alîkarekê berdewam geşedan û dahînana zelamî bûye. Lewra jî zana dibêjin: "li pişt her zelamekê mezin afretek heye." Zelam hest bi jiyanê dike çinku afret di gel de heye zelam hest bi xweşiyê dike, çinku afret jêdera wî ye. Zelam yê piştraste çinku afret li pişt wî heye. Lewra jî afret ku jîn û jêdera jiyanê ye li cem mirova zana rewşenbîr li astê rolê wê civakî û mirovayetî giringiya xwe heye. Her jiyanek nîne bê afret. Heger bidîne hizra xwe û her wesa me bo cara gelekê jî gotiye afret zehmet û azarên biçûk bo vê jî dibe û li ser hindê re xwe dangirana wan jî her ew pê radibe, ya zelamî bi tinê karê ji derveye û peydakirina pare bo jiyana wan ya rojane. Ev hemû wê çendê bo zelamî dide ronkirin ku giringiya xwe hebe li gel zelamî û rêz û heybeta xwe ya taybet hebe. Nexasime heger afret bi xwe alîkariya hevjînî xwe bike û li her nexweşiyekê xwe lê bike te xwedan. Mebesta min ji giringiya afretê li dev zelamî ewe ku çendeha sala bi sanahî li berçav neçe, heger hezek di dilê wê de hebe rêkê lê negire û jiyana wê nexweş bike.

Ji ber gotgotkên xelkekê ku mirov bi xwe li ser xwe bike mal û çinku axaftinên xelkê çi pê nahêne bi tinê sergêjiyê. Heger rastî ku rêzê lê digirî bihêle bi hez û arezûyên xwe şad bibe. Gelek zelam hene hind giringiyê nadine aftetê ango zarokan bihîne û karan bike û zelam çi bibêje wê bike, ango li bin fermana hevjînê xwe nederkeve û boçûna xwe li ser çi babeta nede. Çinku wesa hizir dike ku şerme zelam guh bide axaftina afretan, belku ew zelamê malêye û dişê boçûna wî birêve lê eve guneheka mezine di derheqa afertê de dihête kirin, divê wê jî senga xwe hebe di civakê de. Bi taybet li mala zelamê xwe, çinku heger hat û zarok hebûn da ew jî bi çavekê mezin berê xwe didine dayîka xwe. Afteta xwendevan ango ya xwedan bawername ta radekê dişê hebûna xwe diyar bike û zû bi zû zelamî qebûl neke, zelam jî, ji layê xwe ve rêzê lê digire çinku afret şengestê serekî yê civakiye û binyate bo danana xêzaneka bextewer.